



Australian Government



Agahdarî li ser vaksînê COVID-19 (Pfizer)

Nûve kirina dawîn: 15 Îlona 2021

Derheqa derzî/vaksînê yê da

Pfizer ev vaksîneke ku dikare pêşî li ber COVID-19 bigre berîya merîya mîrov nexweş bikeve. Hewce bi du dozên heye, pirrê cara di navbeyna 3-6 hefte ji hev dûr wê bêtne lêxistin. Di mercên taybetîde dibe ku navbeynek dirêjtir bête pêşniyar kirin) Di Pfizer yê da vêrûsa zindî tune ye, û nikare COVID-19 bi were peyda bike. Têda kodên genetîk pêşekî girîn ji ya vêrûsa SARS-CoV-2 heye ku jêra proteîna sike têye gotin. Piştî we dezî li xwe xist, beden/laşê we vê kopyek/şeklek wek şiklê proteîna tûjik digre, û pergala parasinê a we fêr bibe bo nasîna vê û li dijî vê vêrûsa SARS-Cov-2 çawa ku dibe sedema COVID-19. Bedena mîrova koda genetîk ji zûtirîn têye şikestin.

Lixwe dana vaksînkirinê bi gorî xwesteka we ye û belaş e. Berî ku hûn derziyê li xwe bixin hûn dikarin derheqa her fikar an ku pirsên we di derheqê derzî/aşîya COVID-19 hene li gel dabînkerekê xweyê paastinhe û/ an diktorên xwe ên malbathe ku GP ji tê zanîn, neqaş bikin.

Berjewendiyên vaksînê/derzî'yê

Testê/cebandinek berfireh ên klînkî nîşan da ku Pfizer di pêşilêgirtin a COVID-19 de bo mirovên 12 salî û mezintir xwedan bandorek gewre/mezin e. Ew kesên ku du dozê/qursên Pfizer li xwe xistibin ji sedî 95 kêmtir e ku bi semtoma COVID-19 bikevin li heber ew kesên ku vaksîn li xwe dedan e. Ew yeka li ser mirovên temenê di ser 65 salî ji heman rengî ewqas bi bandore, û bo hinek kesên xwedan mercên nexweşîya tîbbî a stabile bi wanre hene.

Parastina li dij COVID-19 wê dîyar bibe piştî 2-3 hefên ku doza/qursa yekem hat lêdan. Dema doz/qurs a pêşîn dikare dest bi hin parastinê bike, dibe ku ew tenê ji bo demek kurt bidomin e. Du doz/qurs wê parazîya herî çêtirîn bicîh bibe. Tu vaksîn wê xwedan bandorek erênî a ji 100'î sed be. Wê mimkin be piştî we vaksîn li xwe xist ji disa hûn COVID-19 bigrin.

SARS-CoV-2 xwedan potansiyleke ku wê bikaribe kesên derzî li xwe xistibe nexweş bike. Heta kû tû semptom an nîşanek sivik ji hebe dikare ev derbasî kesek din bike. Lêbelê, Vaksînên COVID-19 ku neha li Australia tene bikar anîn bi bandore bo kêmkirina îhtimala vayrûsê bigihîne ew kesekî nêzik kû vaksîn lê hatibe xistin heke ew mîrovê enfektebûyî.

Ji bo vey yek girîng e ku piştî vaksînlêdanê berdewam bin bo pêkanên parastine wek: ive measures like:

- mesafeya fîzîkî
- şûştina desta
- bikaranîna maskê ber boz u dev
- ceribandina COVID-19 û karantîn/biserxwe mahîn wek ji aliyê welayet/herêmada têye xwestin.

Heke hun bi du doz/qursê Pfizer hatin aşîkirin, divê disa pêwîste hûn tesên COVID-19 bikin hek we nîşa hebin bi gor pîvanên kriterên testûyîne ên karbidestî a tendûristîya mehelî (w.m. agir, kuxik, êşa gevî/qirike).

Kî dikare vê veksîn/derzîyê li xwe bixe

Kesên temen 12 salî û mezintir dikarin vaksîna Pfizer li xwe bidin.

Kî divê wê vaksîne li xwe nexe

Derzîyê li xwe mexin heke hûn di rewşek wek tiştên li jêr hatîye dîyarkirin:

- **anafilaksî** (cûreyek hesasiyet/raksiyona alerjik agiran) ji ber doza/qursê mRNA vaksîna COVID-19 (w.m. Pfizer an Spikevax (Moderna) berê
- **anafilaksî, piştî rûbirûbûyîna her madên vaksîne**, li gel polîtîlene glikol (PEG) di nav de
- **mîyokraditis û/an** perikraditis girêdahîya wê bi dozek bere ya têgihîştinê ve hebe
- **çi bûyerên din ên neyînî ya ciddî kû**, piştî nixandina derzîlêderê xwedan tecrûbe an pisporê xisûsî ê tenduristîye ku têkildarê doza mRNA COVID-19 (w.m., Pfizer or Moderna) vaksîna (w.m., Pfizer an Moderna) an ji ber sedemên din ên nehatine kûfşîkirin) a berî ve girêdahî be

Tedbîrên bo aşî/derzîbûyîne

Kesên xwedan mercên tayîbet dibe kû miqatek zêdetir li xwe bikin wek 30 deqe piştî vaksîne rawestî bo cavdêrkirinê an bi pisporên alerjî/hesasiyetê misoger bin. Ji karbidestên tewqîhatê/derzîyan bêjin heke bi were evana hebin:

- **hesasiyeteke ji ber ew doze ên berê** bi were peydebû ye an ji ber hin madden mRNA vaksîna COVID-19 (w.m., Pfizer an Moderna)
- **anafilaksî/hesasiyeteke gewre ji ber derzîyan and dermanên din.** Pêşkêşkar wê bi karibe piştrast bike bo we da ev madde û ên vaksîne hemanyekin a wan bi COVID-19 re tune a kû
- mastosîtosis a piştrast kirî bi anafilaksiya dubarekirî ya hewcê wê bi derman kirine heye.

Heke nexweşînek we a xwîne hebe an dermanên bo tenikbûyîna xwîne bikar tinin (antîkoagulans) an ji digrin, ji dabînkere xwe ên derzîya parastinê li we dixe ra bêjin. Wê dabînkere derzîya parasîyê ji were bêje ka bi ewlehîye kû derzî li ser masûlên we bête xistin an na, û kad a herî qence kengê ye ji bo we.

Berîya derzîlêdanê misogerîya rewşên tayîbetmendar

Mîrovên bi xwedan mercên tedbîrdêr bo pfizer

Mîrovên xweda dîrokek ev mercên li jêr dîyarbûyî dikarin Pfizer li xwe bidin lê bele divê şîret ji diktorê malbatê/GP, spesyalîstê derzîlêdanê an bişîjkê dil/qelb bo qençtirîn kada vaksînlêdana were girtin û ka ma li serde tedbîrek têye pêşnîyarkirin:

- Di nêzda (w.m. din nav 6 mehên bihûrîde) nexweşîyên emflementorî ên dil wek mînak mîokardît, perikardît, endokardît
- Taya romatîzma giran (w.m., bi çalekbûyîna êşa emflemasyona li ser dil an nexweşîya romatizma yê giran a dil
- Têkçûna dil ji ber tênebûyê a bihêz.

Mîrovên ku xwedan pergâlên/sîstema parastinê yê lawaz in (immunocompromise)

Kesên xwedan pergâlên parasina lawaz(immunocompromise) in li ew kesên xwedan rewşek tibî ne kû sîstema wan a parastinê lawaz dike. Herweha ew kesên kû dermanên ji bo kû pergala parastina wan didewisine.

Hikûmeta Australîya bi xurtî pêşneyar dike bo ew kesên xwedan bunîyek lewaz û pergala parstina wan bê hêze ku derzîya COVID-19 li xwe bixin. Pfizer vaksînek zindî nîne. Ev derzî bi ewlê ye ji bo ew kesên xwedan bunîyek lawaz.

Kesên bi bunîyek lawaz, li tev kesên bi HIV radek zêde xeterîya girtina nexweşîya COVID-19 bo wan heye, radek bilin a rizkê mirinê.

Xeyrî grubek piçûk a stewr ew kesên bi HIV, ceribandî/teskirina klînkî a Pfizer li ser ew kesên xwedan bunîyek lawazin negihîştîye dawîyê. Em nizanin heke Pfizer bi bandorek baş baş heye bo ew kesên ku immunocompromise- ewê bunîya wan lawaze ango sistema parstine wek ên li ser nifûsa giştî. Di be ku gengaz e ku Pfizer di nav gelên xwedan immunocompromise/bunîya lawazbûyî bi gorî nifûsa giştî ewqas bi bandor nebe.

Jinên bi hemle/dûcan an jîrmijandin

Divê jinên û ên gihîştî ewên bi hemle/dûcanî ne bi rêkûpêk di her qonaxa bihmletîyê de bo wan Pfizer an Moderna werin peşkeş kirin. Ger hûn hewl didin ku bihemle bimînin, ne hewceye hûn vaksîna xwe dereng bixin an jî piştî vaksîne bihemle bimînin.

Jinên bihemle ên bi wan re COVID-19 heye rizqek zê a giran û encamên neyînî yê di dema dûcanîyê da zêdetir dike. Delîlê cihana rastîne de dîyar dikin ku Pfizer ji bo jinên bihemle û ew jinên zarken xwe bi şîrê xwe dimijînin bi ewlê ye.

Heke hûn şîr didine pitikên xwe winê bikaribin derzîya Pfizer li xwe bixin. Pêwist nake hûn piştî we vaksînlêdanê şîrdayîna pitikê xwe rawestînin.

Mîrovên ku berê bi COVID-19 ketibin

Hek hûn berê bi COVID-19 ketibin, ji ew kesên ku derzîyê wê derzî li we bixe re bêjin. Derzîlêdana COVID-19 dikare bo heta 6 mehan ji bête talokandin bo ew kesên ku bi enfeksiyonek giran a SARSCoV-2 nexweş ketibin, wek delil pêşniyar dikin ku enfeksiyona bere rizqê ji nûve bi enfeksiyon ketine bi kêmasî 6 mehan dîne xwarê. Lê bele derzîlêdan piştî ku ew ew bi tevahî ji semtomên nexweşîyê rizgarbûn testpê bike. Bo hinek kesa piştî enfeksiyonê dibe kû ji 6 mehan zûtirin ji vaksîna xwe li xwe bidin. Bi pêşkêşkarê vaksînlêdanre bipeyîvin Heke nexweşîyek berdewamî bi ber eger aCOVID-19 bi were hebe, ji bo kadek bi ewlê li gel diktorên xwe misogerî bikin.

Pfizer û Zarok

Comirnaty ji bo bikaranîna li ser kesên temen 12 salî an mezintir bi awayek demkî hate pejirandin, û wê li kesên ciwantir neyê xistin.

Temînat a ewlê a Pfizer

Pfizer û vaksînen din ên COVID-19 û hêjmarek berfireh a dilxazan ji bo vê lêkolînê li ser ku zûtirin çêkirin û pêşdarbûyîne. Test/ceribandînek klînkî yek ber fireh ku bi dora 44.000 kesan pêşdar bûne dide piştraskirin derzîya Pfizerbi ewlê û bandor e.

The Therapeutic Goods Administration [Rêvebirîya Kelûmêlên Dermanî] nixandina hemî derzîyên li Australîya dike. Ev piştrast dike ku ji bo berî kû derzîyek bête bikaranîn, ew bi ewlehîyek, bandor û bi gorî standardek kalîteyek bilind hatibe çêkirin. Agahdarî di dereqa danasîya pêvajoya a pejirandina derziyên COVID-19 hun dikarin li ser malpera [TGA website](#) bivin.

Dê ewlehîya derzîyên COVID-19 bi awayek berdewamî di dema bernama derzîdayîna COVID-19 da bête şopandin.

Rapor hene ku bandorek pir pir hindik ya alîgir/hessasiyetê, piştî ku vaksîna COVID-19 AstraZeneca, bi hejandina trombocîtan a wîne ve helandîye. Vaksîna COVID-19 AstraZeneca bi renek cûde hatîy afirandin. Delîlek tune ku ew rewşa bi vaksîna Pfizer COVID-19 ve bide girêdan.

Hûn dikarin ew bandorên ango hesasiyên ji ber vaskînê ên biguman bo karmendên we ên tenderest an pisporên din rabigihînin. Ewê li ser nave reportek fermi we bo lijna tenuristîyê a wîlayet and mintîqa hûn li diminin bişînin, an raste rast wê li gel (TGA) biaxifin.

Hek tercîha we ewe kû hûn bixwe rapor bikin ji kerema serdana [TGA website](#) bo agahdarîya li ser awayê ragihîna bandorên seralî ên gumanbar ên ji ber sedema derzîyên COVID-19 bikin.